

Kurteya Rapora Binpêkirinên Mafên Rojnamegerên Jin a 2021'ê ya Platforma Rojnamegerên Jinên a Mezopotamyayê

Dîroka daxuyaniyê: 10'ê Çileyê 2022'yan

Ji çapemenî û Raya giştî re

10'ê Çileyê Roja Rojnamegerên Dixebitin ne rojêke ku em pîroz bikin, rojêke ku em bi rêxistinbûyîna têkoşîna xwe mezin dike ye. Em 10'ê Çileyê roja ku em wekî bingeha mezinkirina têkoşîna raman û azadiya çapemeniyê dibînin bi zext, gefxwarin, girtin, sansur, astengkirin, bêkariyê pêşwazî dikin. Li welatên bi rejîma totalîter, yekperest û ji demokrasiyê dûr tînin birêvebirin ev tablo tê asteke xeternak. Tirkiyeya ku çapemenî lê bûye tenê dengê îktidarê û yekperestiyê diparêze li serê van welatana cih digire.

Bi qeyrana aboriyê ya ku di bingeha wê de qeyrana civakî û siyasî cih digire de bi hinceta biçûkbûyîna aboriyê bi sedan rojnameger ketin wî halî ku karên xwe nikaribin bikin. Hêjmara rojnamegerên bê kar gihaşt asteke mezin. Rojnameger li gelek cihên kar ji ewlehiya civakî dûr in û di bin şerdên dijwar de dixebitin. Ev rewş ji bo jinên rojnameger bi awayekî kûrtir tê jiyîn. Di serî de jin bi hinceta "qeyrana aboriyê" ji kar tînin derxistin. Dîsa herî zêde jin bê ewle û bi buhayê hîn kêmtir dixebitin.

Çêkirina nûçeyan a rojnamegeran a di bin şerdên azad de bi temamî ji holê hatiye rakirin. Hema bêje ji sedî 90 zêdetir rojnameyên weşanê dikin, ajans, televizyon veguherîne alavên weşanê yê îktidarê. Yê li derveyê vê xetê cih digirin jî di bin zextên dijwar de mecbûr dimînin ku pîşeya xwe bikin.

Di nava rojnamegerên dixebitin de herî zêde jî jinên rojnameger wekî hedef tînin nîşandan, di bin zextê de tînin girtin û tê wî halî ku nikaribin pîşeya xwe bikin. Li gor daneyên di rapora me de cih digirin jî herî zêde rojnamegerên jin li cihê kar, li nûçeyan, dema nûçeyan çêdikin dibin hedefa leşker û polîsan. Her wiha zext û tundî li wan tînin kirin. Di salekê de gelek hembûyîşên me di dema şopandina nûçeyan de lêdan xwarin. Gef li wan hatin xwarin, bi kelemçeyê hatin binçavkirin. Hinek jê hatin girtin û derbarê gelek kesan de jî doz hat vekirin. Tevî ewqas zext hatin kirin jî jinên rojnameger dev ji heqîqetê bernedan, ji bo rastiyê ji civakê re ragihînin nûçe li ku be reviyarên wir.

Li Tirkiyeya ku bi lêpîrsînên tînin destpêkirin û dozên tînin vekirin bûye girtîgeheke servekirî gelek rojnameger mecbûr dimînin li qereqolan înzîvî bidin, bi şerdên kontrola edlî tînin berdan, biryara qedexeya derketina derve ji bo wan tê dayîn. 6 jê jin 62 rojnameger ji ber faliyetên xwe yê pîşeya rojnamegeriyê hîn girtî ne. Ew ê têkoşîna me di serî de ji bo rojnamegerên ji ber nûçe û fikrên xwe di girtîgehan de ne û dawiyê ji bo hemû hembûyîşên me bidome. Divê rojnameger li ser karê xwe bin ne li paşya derabeyên girtîgehan bin. Tevî hemû tiştî li dijî zinhîyeta bavîksalarî û zextxwarinê em ê tu carî dev ji rastiyê bernedin. Em ê têkoşîna xwe ya li dijî tundî û zextên patron, mêr, dewletê mezin bikin."

Binpêkirina mafên jinên rojnameger di sala 2021'ê de pê rû bi rû mane wiha ne:

* 6 rojnamegerên jin girtî ne (Ayşenur Parildak, Elif Ersoy, Hatice Duman, Sibel Mustafaoglu, Tulay Canpolat, Ozlem Seyhan).

* 19 rojnamegerên jin di bin çavan de ne.

* 49 rojnamegerên jin dema nûçe çêdikirin ji aliyê polîsan ve hatin astengkirin.

* 19 rojnamegerên jin lêdan xwarin û muameleya ne baş li wan hat kirin.

- * Gef li 5 rojnamegerên jin hat xwarin û ajantî li 2 rojnamegeran hat ferzkirin.
- * Muameleya ne baş li 2 jinên di girtîgehê de hat kirin.
- * Derbarê 9 rojnamegerên jin de bi hinceta nûçeyên çêkirine û parvekirinên platforma dijîtal lêpîrsîn hat destpêkirin.
- * Derbarê 13 rojnamegerên jin de doz hat vekirin.
- * Derbarê 12 rojnamegerên jin de ji dozên li wan hatine vekirin 17 sal, 8 meh û 11 roj cezayê girtîgehê, ji rojnamegereke jin 7 hezar û 80 TL cezayê pereyan hat birîn.
- * 197 carî rûniştina ku rojnamegerên jin dihatin darizandin hat dîtin. Derbarê 18 rojnamegerên jin de biryara beratê hat dayin û derbarê rojnamegereke jin de jî biryara neşopandinê hat dayin.
- * Bi hinceta "îhbar heye" polîsan bi ser mala 2 rojnamegerên jin de girtin û rojnameger nehatin binçavkirin.
- * Ji bo rojnamegereke jin cezayê hepsa malê hat dayin.
- * 3 jinên xebatkarên çapemeniyê ji karê xwe bûn.
- * Qerta çapemeniyê ya rojnamegerekê hat betalkirin."